Newroz Hejmar (77) Rûpel (12) B. Çile 2007z – 2619k

Saleke nû… Hêvî ne bilind

Rêberê Silîvî

Eve sala 2007an jî, weke salên berî xwe, kar û barê xatirxwestinê dike, da ku rê bide salake nû ji temenê vê gerdûna mezin û civaka navnetewî. Mixabin ku ev sal jî, mîna salên berî xwe li seranserî cîhanê, bi kul, êş û xwîn derbas bû. Hawîr, golên xwînê, cendekên kuştiyan, teqîn û wêran û dûman e, bi dehê hizaran zarok sêwî man, bûkên ciwan bî man, mirov di nava agir û dûmanan de qijilîn û kizirîn…!!

Pirsek serî hildide û bersivê dixwaze, ew jî eve, gelo, berê ademîzadiyê bi kû de ye?, berê wê li avakirinê yan li wêrankirinê ye?, rişim û hevsarê vê tevkuştin û xwekuştinê di destên kê de ye?.

Bêgumane ku, berdewamiya herikandina xwîna mirovan bi vê erzaniyê, karekî hovane, dirindane û kirêt e. Berê ademîzadiyê dide tarî û windabûnê. Divê herkes, nemaze aqilmend, zana û rewşenbîrên hemî gelan dengên xwe dij terorê bilind bikin, daxwaz bikin ku pirsên di navbera dewletan de, di riya diyalog, giftûgo û hevdîtinan de çareseriyê bibînin, rê nedin tu kesî, tu hêzê ku xwîna mirovatiyê birêjin, û mirov, ew tiştê herî buha û bi rûmet li ser rûçikê gerdûnê di nava agirê kîn û zikreşiyê de neşewite..!!.

Eger her kesê xwedî hêz bixwaze her tiştî bi darê zorê ji birayê xwe bistîne, wî riswa û perîşan bike, mirovatî seqet û kulek dibe, civak, hêdî hêdî bi ser civaka lawiran de diçe, yasaya dehlê ya malmîrate konê xwe vedigre, mirovatî tê perçiqandin…!! Lê, eger her mirovek mafê xwe nas bike û zanibe li hêla din, mafê birayê wî yê mirov heye, nabe ew bi ser de here, derbas bike, wê demê, aştî, biratî û dostaniya gelan şax vedide, mirovatî geş dibe, berê me û zarokên me hemiyan dikeve ronahiyê, dikev xweşî û şahiyê.

Belvkirina çanda mafê mirovan di cîhanê de, karekî pêwîst û giring e, weşandina prensîp û ramanên civaka sivîl, erk û stubarê hemî rewşenbîr, siyasetmedar, komele û çalakvanên mafên mirovan e, çimku bi weşana van nerîn û bîrbaweriyan, rikgîriya nijadî û olî ko dibe, rê li pêş mafên mirovan û dozên gelan dûz dibe.

De bila xebata hêzên demokrat li seranserî cîhanê digel xebata dezgehên mafên mirovan bi hev re bêne hûnan, mil li mil, ji bo hilweşandin û tunekirina terorê ji civaka navnetewî li ser bingeha parastina mafên mirovan û azadiya gelan.

Hêviya me ewe ku sala bê, sala azadî, aştî û wekheviyê be, sala demokrasî û rêzgirtina mirovan be, da azadîxwaz û welatparêz di zindan de nemînin, mirov ji bo nerînên xwe yên aştiyane neyên terorkirin. **30.12.2007**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de